

## Agahahiye qursê ku dê 1.4.2018 destpê bike

### Elmanî hîn bibin – ew hêjayê hînbûnê ye.


Ji bo Kesên ku li Kantona Gallenê rûdinin beşdarê qursa xwendin-nivîsandin û Elmanî ya heta asta B1'ê bibin, Kanton û Hikumeta federal destekê dide wan.

Herçî kesên şertên li jêr bikarin pêk bînin, dikarin **200 dersên Elmanî, 200 dersên xwendin û nivîsandinê** bi erzanî werbigrin:

- Kesên ku rûniştvanê Kantona St. Gallen ne.
- Divê dahata bibace (perê hûn kar dikin) ji 40,000 CHF'an kêmtir be ji bo jin û mêr, an jî malbatan divê dahat ji 55,000 CHF'an kêmtir be.
- Kesên ku bêbace dixebitin an jî hisaba perê wan nehatibe bibace kirin (di resmîyetê de xuya neke), ji sedî 75'an dahata wan ya seranserê salê, dê wek bace bê hisap kirin.
- Dahata wan ya bibace divê ji 50,000 CHF'an kêmtir be.
- Divê destûra xebatê ya biyanî ji bo dereca B,C,L hebe an jî ew hemwelatîyê Swîsre'yê bin.
- Divê heqê qursa wan ji aliyê saziyek dî(mesela; ofîsên refaha civakî, AHV-IV meaşê teqawîtbûnê, RAV, SUVA, an jî Kardêr) neyê dan.
- Kesên xwe di qursan de qeyd bike, divê bikeve herî kêr ji sedî 80'ê dersan. (bêdewamî divê nekeve binî ji sedî 80'an)
- Piştî qurs xelas bibin, perê hatî dan cardî nikare bê stendin.

Heke hûn van şertan pêk bînin û serîlêdana we bê qebûl kirin, divê dibistana zimanê ji we re fatûraya rêjeya bi erzanî bişîne. Di Dibistanên Elman yên Kantonê ku hatine akrîdîte kirin de, ew erzanî dikare bê bikaranîn.

Ji bo hûn bi erzanî xwe qeyd bikin, ji lîsteyê [Dibistanekê akredîtekirî](#) bijêrin û bi dibistana zimanî re [serî lê bidin](#). Dibistan dê bi destûra we, serîlêdanê ragihîne Ofîsa Karên Civakî. Ji bo zêdetir agahîyan, li malpera Kantonê binêrin: [www.deutschkurse.sg.ch](http://www.deutschkurse.sg.ch).





## **Pêvajoya bidestxistina rêjeyên erzanî**



1. Beşdarên qurs (CPT) li dibistanê qeyd bikin.
2. CPT, ji Ofîsa Karên Civakî û dibistana zimanî re pêkanîna şertan dipejirîne.
3. Serîlêdan ji distana zimanî re tê şandin û bi rêya e-maîlê ji OSA(Ofîsa Karên Civakî) re tê ragihandin. Serîlêdan, dikarin herdem bêne şandin. Lê dîsa jî, berî ku ders biqedin ev yek divê bêne durust kirin. Bi tenê serîlêdanên bi forma resmî ya ji OSA re hatî kirin têne qebûl kirin.
4. Serîlêdan ji aliyê OSA'yê (piştî tê wergirtin) di nav sê hefteyan de tê kontrol kirin. Dibistanên zimanî di nav wan sê hefteyan de, xwe ji dana fatûran vedikêşin. Heke dibistana zimanî di nav wan sê hefteyan de, ji aliyê OSA ve ti agahiyên wernegrin, rêjeya erzan wekî ku hatiye dan tê qebûl kirin. Piştî bi awayekî serkeftî qedandina qurs, ti rêjeyên bi erzanî yên hatî dan nikarin bêne xwestin.
5. OSA dikare agahiyên radestkirî yê CPT'ê kontrol bike û belgeyên pêwîst ji serîlêderan daxwaz bike.